Region Halland

2016-04-10

# Patientinformation om latent tuberkulos, kurdiska

# Ger encama testa IGRA ya we positîf (zêdek) be

Li Norwêc, hinek kes her tim tên testkirinê ji bo tuberkuloz (Koxik) bi rêya testa xwînê IGRA re.

**Wateyê vî çî ye ger encama testa IGRA zêdek/positîf be?**

IGRA ya zêdek tê wê wateyê ku we tuberkuloz heye. Ev yek nayê wê wateyê ku hun nesaxin. Tê bawerkirinê ku 1/3 ji nifûsê cîhanê IGRA zêdek heye bê tecrube kirina nexweşiya tuberkulozê, bi vî wateyê ku ev kes tiştek heye ku vegirtina veşartî ya tuberkuloz jê re dibêjin.

**Vegirtina veşartî ya tuberkuloz xeter/metirsîdar e?**

Kesek ku vegirtina veşartî ya tuberkuloz heye, ev xeter heye ku di jiyanê xwe de nexweşiya tuberkulozê pêbikeve. Nêzike 1 di 20ê nifûsê cîhanê re nexweşiya tuberkulozê pêdikeve. Xetera pêketina tuberkuloz herî zêde dibe piştî vegirtina we bi tuberkuloz ê, an ger sîstema ewlehiya laşên we ji ber nesaxî yên din ne xurt be (wekî mînak kotîbûn bi HIV) an heke hun di dema tîmarkirinê de bin (wekî mînak ji bo nexweşiya seretanê). Rêyên tîmarkirinê hene ji bo tîmarkirina tuberkulozê û piranîyên kesên nesax tên tîmarkirin û çê dibin.

**Ez dikarim kesên din jî nesax bikim?**

Kesên ku tuberkuloz a veşartî hene, nesax nînin û kesên din jî nesax nakin.

**Tîmarkirin me re pêdiviye?**

Tîmarkirinê berbendkirî ji bo rêlêgirtina pêşketina tuberkuloz belkî pêdivî be li hinek rewşên taybet de. Ev biryar jî ji aliyê doktur tê texmîn kirin. Ev tîmarkirin ji bo hinek kes pêdiviye, wekî mînak, kesên ku nû vegirtî, zarokan û kesên ku sîstema ewlehiyê laşên wan ne xurte.

**Tiştek heye ku divê min agahî ser de hebe?**

Ger we IGRA ya zêdek hebe, ne pêdiviyê ku hun cur û şêwazên jiyana xwe biguherin, lê ger hun nesax ketin, pêdiviye dokturê xwe bidin ragihandin ku hun IGRA zêdek in/an tuberkuloz a veşartî heye ji ber ku hun yeqîn bin ku dermanê rast we re tê dayîn. Ev bi taybet raste ger nîşanên nexweşiya tuberkuloz ser we bê serrastkirin, wek ev nîşanên jêrî:

o kuxika domdar (zêdetir ji 3 hetfiyan)
o ta ya domdar
o xwêdana bi şev
o kêmbûna giraniya beden (zeîf bûn)

http://www.folkhalsomyndigheten.se/amnesomraden/smittskydd-och-sjukdomar/smittsamma-sjukdomar/tuberkulos-tbc/

Mats Erntell
Smittskyddsläkare
Region Halland

Mats Erntell
Smittskyddsläkare
Smittskydd Halland
Hallands sjukhus Halmstad
301 85 Halmstad

Tel. 035-13 16 07
Fax: 035-13 06 08

mats.erntell@regionhalland.se
smittskydd@regionhalland.se
www.regionhalland.se/smittskydd